

Belavoka kursa întegrasyonê

Ji bo kesên biyanî, ku mafdarê beşdarbûnê ne û kesên ku nû hatine Almaniya û mecbûrî beşdarbûnê ne û herweha ji bo biyanîyên mecbûrî beşdarbûnê ne, ku demeke dirêj e li Almaniya dijîn.

Hemwelatîyên hêja,

Li gorî yasaya rûniştinê (Aufenthaltsgesetz), mafê we heye, ku hun beşdarî kurseke întegrasyonê bibin yan jî dibe ku mecbûr bin tevî vê kursê bibin.

Kursa întegrasyonê çi ye?

Kursa întegrasyonê ya giştî ji 600 saetên dersa ziman û 100 saetên dersa rênemayî pêktê. Kursa ziman ji çend beşan pêktê, ku her beşek ji 100 saetan pêktê. 300 saetên pêşî wek kursa ziman ya bingehîn e û 300 saetên dawî jî wek kursa pêşketinê tê binavkirin.

Di kursa ziman de hun dê fêrî wan peyvan bibin yê ku ji bo jiyana we ya rojane pêwîst in. Wek peyvên pêwîst ji bo têkiliyên we bi dam û dezgehên dewletê re û bi danûstandina bi gundî û cîranan re û bi hevalên cihê kar re û ji bo nivîsandina nameyan û tijekirina pirsnameyan.

Kursa rênemayî wê we di derheqê jiyana li Almanya agahdar bike û zaniyarian di derheqê rêbazên yasayî yê komara Almaniya û herweha derbarê çand û dîroka nuh ya vî welatî deyne ber destên we.

Hindek kursên integrasyonê yê taybet hene, wek mînak kursên ji bo jinan, ji bo dayik û bavan, ji bo ciwanan û herweha ji bo kesên, ku hîn baş nizanin bixwînin û binivîsin. Ev kurs ji 1.000 saetên dersê pêktên. Gava ku hun bixwazin pir zû fêrî ziman bibin, hun dikarin tevî kurseke xurt (Intensivkurs) bibin. Ev kurs ji 430 saetên dersê pêk tê.

Kîjan kurs bi kêrî we tê û ji kîjan beşê hun dikarin destpêbikin, wê rêvebirê kursê bi rêya ezmûnekê berî destpêkirina kursê tesbît bike.

Tevlêbûna di ezmûna dawî de

Ezmûna dawî ji ezmûna ziman û ji ezmûna rênemayî pêktê. Gava hun di ezmûna ziman de tesbît bikin, ku hun pak bi zimanê almanî dizanin û hun di ezmûna rênemayî jî de biserkevin, wê gavê hun kursa întegrasyonê bi serfirazî xelas dikin û hun dê bawernameya kursa întegrasyonê „Zertifikat Integrationskurs“ bistînin.

Gava hun bisernekevin, hun dê belgeyekê werbigirin, ku tê de encama ezmûnê hatiye nivîsandin.

Tevlêbûna di ezmûna dawî de bê pere ye.

Başiyên tevlêbûna di kursa întegrasyonê de

Biyaniyên ku ji welatekî hatine, ku ne endamê yekîtiya Ewropa ye, taku mafê rûniştinê yê herdemî bistînin, divê hindek şert û mercan bi cih bînin. Divê ew kes bi kêmanî baş fêrî zimanê almanî bibin û wekî din jî di derheqê zagon û rêbazên civakî de û derbarê rewşa jiyana li Almaniya xwedî zanyariyên bingehîn bin. Ev şert û merc bi serfirazî derbaskirina kursa întegrasyonê tene cih. Her wekî din jî dibe ku hun bikaribin berwext hemwelatînameya almanî werbigirin.

Her wekî din jî bi hînbûna zimanê almanî di kursên întegrasyonê de wê jiyana we ya rojane li Almaniya çêtir bike û derfetên we ji bo bidestxistina kar jî wê pirtir bibin.

Qeydkirina ji bo kursa întegrasyonê

Heger hun mafdarê tevlîbûna kursa întegrasyonê bin yan heger hun mecbûrê tevlîbûna wê bin, wê demê hun dê nivîseke çesbandî (Belgeya mafê tevlîbûnê) yan ji dezgeha karûbarê biyaniyan (Ausländerbehörde) yan jî ji wê dezgeha berpîrs ji bo alîkariya „Arbeitslosengeld II“ werbigrin. Li gel wê nivîsê yan belgeyê wê lîsteyeke xwendegehên nêzîkî mala we ji we re bişînin, ku kursên întegrasyonê pêşkêş dikin.

Ji kerema xwe re navê xwe ji bo kursa întegrasyonê li cem wê xwendeghê qeyd bikin, ya ku ji we re hatiye destnîşankirin û belgeya mafê tevlîbûnê (Berechtigungsschein) pêşberî wî cihê bikin. Heger navê wê xwendegehê ji we re nehatibe destnîşankirin, ji kerema xwe re di zûtirîn dem de navê xwe li cem xwendegeheke bi dilê xwe qeyd bikin. Heger di belgeya mafê tevlîbûnê de li jêr „Mafê tevlîbûnê yan mecbûriya tevlîbûnê heta vê demê misogir e“ demek hatibe destnîşankirin, wî çaxî hun dikarin yan jî divê hun xwe heta gelekî dereng dawiya wê dema destnîşankirî li cem xwendegehekê ya li cem wê xwendegeha ku ji we re hatî binavkirin, qeyd bikin.

Taku tevlîbûna we di kursekê de di zûtirîn dem de misogir bibe, dezgeha federal ji bo karûbarê koçberiyê û penaberan (BAMF) dikare we bişîne xwendegeheke taybet ji bo kursa întegrasyonê.

Xwendegeha ku kurs pêşkêşê dike, mecbûr e, ku ji we re bêje, ka kengî çaverê ye, ku kurs destpêbike. Divê kurs ne derengtir ji 6 heftiyên piştî derbasbûna qeydkirina we destpêbike. Heger di van her şeş heftiyên de kurs destpênekir, divê xwendegeha kurs we agahdar bike. Heger hat û we li cem xwendegeheke din kursa întegrasyonê peyda kir, wî çaxî divê xwendegeha berê belgeya mafê tevlîbûnê li we vegerîne.

Ji kerema xwe re haydar be, ku mafê we ji bo tevlîbûnê dişewite, heger hun ji ber sebebên girêdayî bi şexsê we ve di navbera salekê de piştî qeydkirina di kursa întegrasyonê de dest bi kurs nekin yan jî heger hun bihtir ji salekê dev ji kurs berdî yan jê dûr kevin.

Tevlîbûna bi rêk û pêk di kursê de

Taku hun bigîhîjin armanca kursa întegrasyonê, divê hun bi rêk û pêk û li gorî rêbazan tevlî kursê bibin. Ev tê wê wateyê, ku hun bi rêk û pêk tevlî dersan bibin û herweha tevlî ezmûna dawî jî bibin. Bi serûber berdewamkirina kursê bo vê yekê jî girînge, ku piştî bikaribin kurs dubare bikin, heger hun di ezmûnê de biserneketin. Gava hun bixwazin, rêvebirê kursê dikare serdana we ya bi serûber bi renegekî nivîskî tesbît bike û belgeyê derbarê vê yekê radestî we bike.

Bi giştî guherandina kursê yan xwendegehê bi tenê piştî temamkirina beşekî kursê mumkin e. Guherandin bi tenê di hindê rewşên taybet de mumkin e, bi taybet gava ku merov mala xwe biguhêze devereke din yan heger ji nîv dewam bike dewama sax yan wekî din yan taku dayik û bav karibin hay ji zarokên xwe hebin yan jî taku merov karibe dest bi fêrbûna karekî bike (Ausbildung) yan taku karibe dest bi karekî bike, û ev guhertin bi tenê piştî temamkirina beşekî kursê mumkin e.

Buhayê kursa întegrasyonê

Divê hun tiştê para xwe serê dersek 1,95€ bidine rêvebirê kursê. Ev mesref divê berî destpêka her beşekî ji beşên kursê ku ji 100 dersan pêk tên û berî destpêka kursê rênemayî were dayin. Gava hun tevlî hindê dersan nebin, ev buhayê van dersên ku hun tevlî nebûne li we şunde nayê vegerandin. Gava derhatê we yan meaşê we yê heyvana tune be, wê gavê ew kesê, ku mesrefa we girtiye ser xwe, divê vê mesrefa kursê bide.

Dezgeha federel (BAMF) dikare li vê mesrefê bibore, gava ji ber meaşê we yê hindik dayîna vê mesrefê ji bo we gelekî zehmet be. Bo lêborîna ji mesrefa kursê, divê hun bi nivîskî li ba wargeha herêmî ya dezgeha federel daxwaz bikin (li lîsta navnîşana binere).

Ji kerema xwe re kopiyekê ji belgeya meaşê xwe yan belgeyekê ku desttengiya we tesbît dike bi daxwaznameya xwe re bişînin (Kopiyekê ji belgeyê, wek mînak danezaneke perê betaliyê ya II, alîkariyên civakî, alîkariyên xanî, krêdiya xwendevanan [BAFöG], perê zarokan (Kindezuschlag), alîkariya madî li gorî yasaya piştgirya penaberan, bexşandîna ji mûçeyên xwedîkirina zarokan li baxçê zarokan, bexşandîna ji mûçeyên lîsansa radio û televîzyonê (GEZ), bilêta civakî ya heremî û alîkariya ji bo zarok û gêncan li gorî yasaya civakî (SGB VIII) û hwd). Ji kerema xwe re vê daxwaznameyê berî despêkirina kursê pêşkêşî dezgeha elaqedar bike. Heger we ev daxwaznameya xwe piştî destpêkirina kursê pêşkêş kir, behra bihtir ew mesrefa ku we berî destpêkirina kursê dayî nema li we tê vegerandin.

Heger hun „Arbeitslosengeld II“ distînin û heger dezgeha berpirsiyar we ji bo tevlêbûna kursa întegrasyonê mecbûr kiriye, wê gavê ji xwe hun ne mecbûr in mesrefa kursê bidin. Di rewşeke wisa de ne pêwîst e, ku hun daxwaznameyê pêşkêşî dezgeha federel bikin.

Guhdana zarokan

Heger pêwîstiya we ji bo tevlêbûna kursê întegrasyonê bi guhdana zarokan hebe, hun dikarin bi berpirsê kursê re biaxivin. Ewê we derbarê derfetên li ber dest ji bo guhdana zarokan agahdar bike.

Bişûndevegerandina mesrefa kursê

Heger ku hun piştî 8.12.2007 bi awayek biserketî tevlî ezmûna dawî bûbin, wî çaxî dezgeha federal (BAMF) dikare serê sedî 50î ji mesrefa kursê li we vegerîne. Lêbelê ji bo pêkhatina vê yekê divê di navbera standina mafê tevlêbûna kursê jibo cara pêşî û ezmûna dawî de ji du salan bêhtir zeman derbas nebûbin. Ji bo bişûnvestandina mesrefê divê hun daxwaznameyekê bidin wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF).

Mesrefa çûnûhatinê

Heger hun alîkariya betaliyê (Arbeitslosengeld II) distînin û hun ji aliyê dezgeha berpirsiyar ji bo tevlêbûnê hatibin mecbûr kirin yan heger dezgeha federal (BAMF) hun ji dayîna mesrefa kursê efû kiribin, hun dikarin perçeyekê ji mesrefa çûnûhatina kursa întegrasyonê wek alîkarî bistînin. Ev alîkarî wê ji bo her rojê kursê were hisabkirin. Lê mercê sereke ji bo vê alîkariyê herdem ew e, ku cihê kursê ji kêmanî 3 kîlometran ji mala we dûr be. Ji bo dayîna perçeyekê ji mesrefa çûnûhatina kursa întegrasyonê divê hun daxwaznameyekê bidin wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF).

Dubarekirina kursa pêşketinê

Heger hun di ezmûna ziman de bisernektin, hun dikarin ji bo carekê heya 300 seatên dersê dubare bikin û careke din bê pere tevlî ezmûna ziman bibin. Lê divê helbet hun bi rêk û pêk tevlî kursê bûbin û li dema dersan hazirbûbin.

Ger ku hun tevlî kurseke fêrkirina xwendin û nivîsandinê dibin, wê demê tevlêbûna we di ezmûna ziman de ne pêwîst e.

Taku hun karibin tevlî dubarekirna kursê bibin divê hun daxwaznameyeke nivîskî arastey wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF) bikin.

Çend têbinî derbarê mecbûriya tevlîbûnê

Heger dezgeha karûbarê biyaniyan yan dezgeha berpirsiyar ya „Arbeitslosengeld II“ hun mecbûr kirine, ku hun tevlî kursa întegrasyonê bibin, divê hun di demeke herî zû de serî li rêvebiriya kursek integrasyonê bidin û bi serûber herne kursê.

Heger hun wisa nekin, ev tiştên jêrîn dikarin rûbidin:

- dikare bandorê li ser biryara dirêjkirina mafê we yê rûniştinê bike,
- Heger hun alîkariyê ji sosyalê distînin, ev alîkarî dikare were kêmkirin.
- Dezgeha karûbarê biyaniyan (Ausländerbehörde) dikare ji we daxwaz bike, ku hun para xwe ya mesrefan bo her dersên kursê 1,95 Euro serê her dersekî, ji bo temamê kursa întegrasyonê berî destpêkê bi carekî ve bidin.
- Cezayê pereyan dikare li we were birîn.

Gava hun bi serûber tevlî kursa întegrasyonê nebin, wî gavê rêvebirê kursa we divê dezgeha karûbarê biyaniyan an jî dezgeha berpirsiyar ji bo „Arbeitslosengeld II“ di vê derheqê de agahdar bike.

Tiştên din yên divê ku hun pê bizanibin

Hun dikarin hemu pirsname û daxwaznameyên ku di vê belavokê de hatine binavkirin ji birêvebirê kursê, ji wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF) bistînin. Tevlî vê yekê jî hun dikarin li navnîşana înternetê jî ya “www.bamf.de” jî bibînin.

Di vê belavokê de agahdariyên herî girîng derbarê tevlîbûna kursa întegrasyonê hene.

Birêvebirê kursê wê derheqê naverokên din yên kursê agahdariyan bide we.

Ji bilî vê yekê jî ji kerema xwe re hayadarî xizmetguzariyên dazgehên şêwirmendiya koçberiyê û xizmetguzariya koçberiya ciwanan bin. Ev dezgeh dikarin alîkarîya we ji bo dagirtina pirsnameyan bikin û bersiva pirsên we bidin û guh didin pirsgirêken we û dikarin herweha ji bo we li kurseke herî baş bigerin. Hun dikarin navûnîşanên dezgehên şêwirmendiya koçberiyê û xizmetguzariyên koçberiya ciwanan yên li der û dora we ji dezgeha karûbarê biyaniyan (Ausländerbehörde) ya herêmî û ji wargeha herêmî ya dezgeha federal (BAMF) yan jî ji navnîşana înternetê ya “www.bamf.de” werbigrin.

Ji kerema xwe re hayadar be ku di dema tevlîbûna we ya kurseke entegrasyonê de sîgorta yan tamîna we ji bo qezayan nîn e.